Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :454 nameronahi@gmail.com 24- Îlon - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Bi hatina zivistanê re koçber li benda alîkariyê ne



Welatiyên di kampa Til El-Bêa ya koçberan bi hatina zivistanê re bi zehmetiyan re rû bi rû ne.

Kampa Til El-Bêa di meha Sibata vê salê de bi armanca pêşwazîkirina koçberên ku ji ber êrîşên DAIŞ`ê û ji herêmên rêjîma Sûriyê reviyane, hate vekirin.

Hejmara koçberan li kampê gihaşt 100 malbatan. Ev koçber li ser 70 konan hatine belavkirin. Pirraniya koçberan jin û zarokên ji herêmên Dêrazor, Beyara Tedmurê ya Humusê ne.

Bi nêzîkbûna zivistanê re rêxistinên mirovî ku alîkariyê pêşkêşî koçberan nakin, koçber gelek zehmetiyan dikişînin. Koçber çav li rê ne ku pêwîstiyên wan ên zivistanê bi cih bên.

Ji ber nebûna toreyên kanalîzasyonê di nav kampê de metirsiya belavbûna nexweşiyan di nav koçberan derdikeve holê. Her wiha di aliyê xwarin, vexwarin, xizmetên tendurustî û pêdiviyên jiyanî de jî koçber zehmetiyan dikişînin.

Şer û pevçûnên ku li herêmê rû dane, bandoreke neyînî li derûnî û kesayeta zarokan û bi taybet zarokên ku gelek sal di bin serweriya DAIŞ`ê de mane, dikin. Dîsa, di encama binpêkirinên DAIŞ`ê de zarok bê perwerde man.

Bi nêzîkbûna zivistanê re zehmetiyên koçberên Kampa Til El-Bêa zêde dibin. Konên heyî wan ne ji germ û ne ji sermayê diparêzin.

Ji bo çareserkirina pirsgirêkê bi awayekî demkî, koçber dîwarên ax û ji keviran ava dikin, da ku av derbasî konên wan nebe.



Rêxistinan mirovî heta niha tu alîkarî pêşkêş nekirine. Lê belê koçber ji bo debara xwe di nav zeviyan de dixebitin û ev kar jî bi dest hemû koçberan nakeve.

Koçberan destnîşan kir ku rêxistinan ji du mehan ve tu alîkarî pêşkêş nekiriye. Koçberan diyar kirin ku Meclisa Sivîl a Reqayê alîkariya ku 15 rojan carekê belav dike têra wan nake. Koçberan bang li cîhanê kirin ku alîkariyê pêşkêş bikin.

Hejmara koçberên li Reqayê û gundewarên wê bi cih bûne gihişt 400 hezar koçberî. Ev koçber ji gundewarên Hema, Heleb, Hums Reqa û Dêrazorê hatine...

***ANHA***





## Kewên Gozel tên tune kirin



Kewa Gozel ku di wêje, klam û şîretê Kurdan de timî qala wê tê kirin, ji ber polîtîkayên şer ên dewleta Tirk tune dibin.

Kewa Gozel bi xeml û qebqeba xwe li Kurdistanê navdar e. Di gelek helbest, çîrok, klamên dengbêjiyê û şîretan de timî qala Kewa Gozel tê kirin. Ji ber planên şer a dewleta Tirk û şewitandina daristanan Kewa Gozel jî di rewşeke metirsîdar de ye.

### HEJMARA WAN GELEKÎ KÊM BÛYE

Kewa Gozel ku bi 34 cm'î mezin e, dema ku baskên xwe vedike dibe 55-60 cm. Bi giranî mehên Sibat an jî Adarê kurk dikevin û herî zêde 21 hêkan dike. Hejmara Kewa Gozel berê li Kurdistanê gelekî zêde bû. Lê belê ji ber dermanên çandiniyê û nêçirvaniya bi nezantî, hejmara wan gelekî kêm bûye. Polîtîkayên şer û şewata li daristanan ku bi destê dewletê li Kurdistanê tê kirin, gefeke mezin li hebûna Kewa Gozel dixwin. Şêniyên herêmê û mirovên ku kewan xwedî dikin, ji ber vê yekê bi fikar in û dixwazin êdî tiştek ji bo kewan bê kirin. Ahmet Batmaz (52) ê li Şirnexê got, "Ji zarokatiya min ve li mala me kew tê xwedîkirin. Bavê min jî ji kalkê xwe hîn bûye. Li mala me her tim herî kêm 3-4 kewên gozel hene.

Mîna ku ji malbatê bin me ew xwedî dikir. Bi qebqeba xwe dilê me şa dikin. Dema ku nexweş nekeve, em ti carî wan serjê nakin. Lê dewlet wan qir dike."

### DEWLET HEYWANAN QIR DIKE





Batmaz diyar kir ku berê li quntarên çiyayê Cûdî kewên gozel ref bi ref digeriyan û got, "Ji ber şewata ku dewlet derdixîne û operasyonên leşkerî em nema dikarin kewên gozel bibînin. Dema zarok bûm li her 3 ji 10 malan kewên gozel hebûn. Niha nîne. Ya hatin koçberkirin ya jî hatin kuştin. Dewlet ji bo xwezaya Cûdî û Gabarê talan bike her tiştî dike. Heywan tên kuştin û bi şewatê giha, dar û heywan tên şewitandin. Vê yekê jî ji ber dijminatiya xwe ya li Kurdan dike. Divê dawî li vê yekê were anîn. Naxwe wê xweza nemîne." Şirnexî ji saziyên pêwendîdar dixwazin ku ji bo Kewên Gozel bikevin nava liv û tevgerê...

***ANF***

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 454 24- îlon- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Li derdora Hecînê 5 çete hatin kuştin



Qonaxa dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê ya bi navê Şerê Tunekirina Terorê li dijî çeteyên DAIŞ`ê dewam dike. Pêşdeçûna şervanên QSD'ê ber bi bajaroka Hecînê ve jî didome. Hat ragihandin ku di encama êrîşa balafirên Koalîsyona Navneteweyî ya li dijî baregeheke çeteyên DAIŞ`ê ya li gundê El-Şecil de 5 çete hatin kuştin.*R-2*

# LI ÎMRALIYÊ TECRÎDA DI NAVA TECRÎDÊ DE

**Zext û êşkenceya li Îmraliyê li ser rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan roj bi roj zêde dibe. Dewleta Tirk ku tecrîdeke giran daniye ser Rêber Ocalan, herî dawî jî hat hînbûn ku cezayê dîsîplînê li Ocalan hatiye birrîn û 6 mehên din bi parêzeran re hat qedexe kirin.**

### OCALAN 20 SALE TECRÎDKIRIYE

Nerazîbûnên li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan zêde dibin. Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan têkildarî 'cezayê dîsîplînê' û tecrîda li ser Ocalan li avahiya HDP'ê ya Stenbolê civîna çapemeniyê li dar xist. Bûldan diyar kir ku 20 sal in li ser Ocalan tecrîd heye û got, "Birêz Ocalan di nava tecrîdê de hatiye tecrîdkirin." Buldan di serî de CPT bang li saziyên li Ewropayê kir ku têkildarî rewşa Rêber Ocalan tavilê bikevin nava liv û tevgerê.

### DIXWAZIN TECRÎDÊ REWA BIKIN

Parlamentera HDP'ê ya Agiriyê Dîrayet Taşdemîr bal kişand ser qedexekirina hevdîtinên parêzeran ên bi Ocalan re ku bi bahaneya cezayê dîsîplînê 6 mehan hate qedexekirin û got, "nêzîkatiyeke polîtîk a kêfî ye. Desthilatadrî û dadgeriya wê ku bi hincetan hewl didin tecrîdê rewa bikin, niha jî bi cezayê dîsîplînê dixwaze şer û kaosê giran bike. Ev cezayê dîsîplînê êrîşa li dijî rûmeta mirovan e. Nabe ku em vê yekê qebûl bikin."

### DIVÊ EM DENGÊ XWE BILIND BIKIN

Hevberdevka Kongreya Demokratîk a Gelan ya li Tirkiyê Gulistan Koçyîgît nerazîbûn nîşanî tecrîda li ser Rêber Ocalan da û wiha got, "Divê ew herî zêde hay ji Girtîgeha Îmraliyê hebin. Niha jî derket holê ku cezayê dîsîplînê li Birêz Ocalan hatiye birrîn. Bi hincetên pûç hevdîtin tên astengkirin. Heta ku em li hemberî tecrîda li Îmraliyê dengê xwe bilindtir nekin, em nikarin qala wekhevî û azadiyê bikin." *R-4*



## Li Biradostê 2 leşkerên Tirk hatin kuştin

Çalakiyên gerîla yên li dijî artêşa Tirk yên li başûrê Kurdistanê dewam dikin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser mijarê daxuyaniyek da û got, "Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de roja 22'ê Îlonê li girê Lêlîkan ê Bradostê li artêşa Tirk xistin. di encamê de 2 leşker hatin kuştin." *R-2*

## Rûhanî û Xamaney DYA û welatên kendavê sûcdar kirin

Serokkomarê Îranê Rûhanî ji ber êrîşa roja Şemiyê ya li Ahvazê ku 29 miribûn welatên Kendavê sûcdar kir. Rûhanî diyar kir, DYA hewl dide li Îranê rewşeke nearam biafirîne, lê wê bi ser nekeve û got, Îran wê ji binê barê pêkanînan rabe û DYA'yê jî wê ji ber êrîşkariya xwe poşman bibe. Lîderê olî Xameney jî got, "Ev cînayet dewama komployên hikumetên ku ji aliyê DYA'yê ve li herêma me hatine bicihkirin e." *R-2*

## Em ê dagirkeran ji Efrînê derxînin



Meş û çalakiyên li dijî dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê û her wiha ji bo piştgiriya berxwedana Efrînê dewam dikin. Bi hezaran welatiyên Tirbespîyê, Girkê Legê, Çilaxa û Til Koçer ji bo piştgiriya berxwedana Efrînê meşek lidarxistin. Meşa ku li Tirbespiyê hat lidarxsitin veguherî mîtingê. Di mîtingê de axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku rizgarkirina Efrînê erka hemû gelên Sûriyê ye. *R-5*

## Armanca sereke ya PYD'ê Rizgakirina Efrînê ye



Hevseroka PYD`ê Eyşo Hiso beşdarî civîneke li Dirbêsiyê ku bi wesîleya salvegera damezrandina PYD'ê hate lidarxistin bû û diyar kir ku armanca partiya wan a sereke rizgarkirina Efrînê ye. Eyşe got, "Ji bo ku gelê me yê Efrînê vegere ser warê xwe em bi hemû hêza xwe dixebitin." *R-3*

## Akademiya Îslama Demokratîk tê vekirin

Li Bakurê Sûriyê Yekitiya Zanyarên Misilman a Herêma Cizîrê amadekariya vekirina Akademiya Îslama Demokratîk dike. Cîgirê Serokê Meclisa Şêwrê ya Herêma Cizîrê Abdulrehman Bedirxan axivî û got, "em dixwazin rastiya exlaqê Îslamê nîşanî cîhanê bidin. Di akademiyê de em ê rêgez û nirxên rasteqîn ên îslamê şîrove bikin." *R-6*

# Li derdora Hecînê 5 çete hatin kuştin

**Qonaxa dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê ya bi navê Şerê Tunekirina Terorê li dijî çeteyên DAIŞ`ê dewam dike. Pêşdeçûna şervanên QSD'ê ber bi bajaroka Hecînê ve jî didome. Hat ragihandin ku di encama êrîşa balafirên Koalîsyona Navneteweyî ya li dijî bargeheke çeteyên DAIŞ`ê ya li gundê El-Şecil de 5 çete hatin kuştin.**



Balafirên Koalîsyona Navneteweyî baregeheke çeteyên DAIŞ`ê li gundê El-Şecil ê girêdayî herêma Hecîn kir hedef. Di encamê de 5 çete hatin kuştin.
Qonaxa dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê ya bi navê Şerê Tunekirina Terorê li dijî çeteyên DAIŞ`ê dewam dike. Nêçegihanê ANHA'yê ku pêngavê dişopîne diyar kir ku balafirên Koalîsyona Navneteweyî li ser baregeheke çeteyên DAIŞ`ê li gundê El-Şecil êrîşek pêk anî. Di encama wê de 5 çete hatin kuştin.
Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê berdewam dike û pêşdeçûna şervanên QSD'ê ber bi bajaroka Hecînê ve dewam dike.

## Nîqaşên di navbera YNK'ê û PDK'ê de mezin dibin



YNK'ê nerazîbûn nîşanî serdana Nêçirvan Barzanî ya Bexdayê da û PDK bi 'lihevnekirinê' rexne kir. Nîqaşên navbera PDK û YNK'ê ku piştî eşkerebûna namzetê YNK'ê yê Serokkomariyê dest pê kirin, mezin bûn. Piştî hilbijartina parlamenta Iraqê ya 12'ê Gulanê her du partiyan li hev kiribûn ku li Bexdayê bi hev re tevbigerin. Û ji bo hevdîtinan li Bexdayê bikin, 'heyeteke hevpar' ava kiribûn.
Lê belê piştî ku YNK'ê Dr. Berhem Salih ji bo Serokkomariya Iraqê namzet nîşan da, PDK'ê îtiraz kir. Li ser vê yekê Nêçirvan Barzanî guh neda 'heyeta hevpar' û çû Bexdayê.
YNK'ê nerazîbûn nîşanî serdana Barzanî da. Polîtburo ya YNK'ê ragihand ku ew bi rêya çapemeniyê bi serdanê hesiyane û PDK sûcdar kir ku 'lihevkirina bi hev re ya li Bexdayê' binpê kiriye.
Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku YNK hîn bi biryar e ji bo berjewendiyên Kurdan biparêze û diyar kir, PDK xwe nade ber nîqaşên hevpar ên li ser namzetê Serokkomariyê.

## 2 leşkerên Tirk hatin kuştin



HPG'ê diyar kir, li Lêlîkanê di çalakiya gerîla de 2 leşker hatin kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser mijarê daxuyaniyeke nivîskî weşand û ev agahî da:
"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de roja 22'ê Îlonê saet 14:30'î li herêma Sidekan a Başûrê Kurdistanê li artêşa TC a dagirker xistin ku li ser girê Lêlîkan ê Bradostê bû. Ji du baskan ve li stargeh û kozikên dijmin hate xistin û di encamê de 2 leşker hatin kuştin.`

## Rûhanî û Xamaney DYA û welatên kendavê sûcdar kirin

Serokkomarê Îranê Rûhanî ji ber êrîşa roja Şemiyê ya li Ahvazê welatên Kendavê sûcdar kir. Lîderê olî Hamaney jî DYA sûcdar kir.
Li bajarê Ahvaz ê Îranê di dema merasîma leşkerî de êrîşek hatibû kirin û herî kêm 29 kes miribûn, bi dehan kes jî birîndar bûbûn.
Serokkomarê Îranê Hasan Rûhanî piştî êrîşê daxuyaniyek da û welatên Kendavê yên destekê ji DYA'yê digirin sûcdar kir.
Rûhanî berî ku biçe New Yorkê ji bo tevlî civînên Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî bibe li Tehranê daxuyanî da. Rûhanî welatên Kendavê sûcdar kir ku desteka fînansî û leşkerî didin Tevgera Demokratîk a Ereb a Ahvazê.
Rûhanî diyar kir, DYA hewl dide li Îranê rewşeke nearam biafirîne, lê wê bi ser nekeve û got, Îran wê ji binê barê pêkanînan rabe û DYA'yê jî wê ji ber êrîşkariya xwe poşman bibe.
Lîderê olî yê Îranê Ayetûllah Hamaney jî li ser êrîşê daxuyaniyeke nivîskî da û got, "Ev cînayet dewama kompoyên hikumetên ku ji aliyê DYA'yê ve li herêma me hatine bicihkirin e."
Wekî din, piştî êrîşê li Îranê 'şîna neteweyî' hate ragihandin.



## Fûad Huseyîn bû Namzetê PDK'ê yê Serokkomariyê



PDK ji bo Serokkomariya Iraqê Fûad Huseyîn weke namzet nîşan da.
Fûad Huseyîn yê endamê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdsitanê bû namzetê fermî yê PDK'ê ji bo serokkomariyê. Hefteya derbasbûyî YNK'ê Dr. Berhem Salih ji bo nazmetiya Serokkomariyê eşkere kirîbû. Tevî Salih û Huseyîn parlamentera berê ya Parlamnetoya Iraqê Sîrwe Ebdûlwahîd û Serdar Ebdûllah jî ji bo serokomariyê namzetiya xwe eşkere kirîbûn.

## Hilbijartin ji bo demeke nediyar taloq bû



Parlamenta Iraqê wê 25'ê Îlonê Serokkomarê Iraqê hilbijarta, lê ev hilbijartin ji bo demeke ne diyar taloq bû.
Piştî hilbijartina serokê meclîsê, wê 25'ê Îlonê Serokkomarê Iraqê bihata hilbijartin.
Li gorî daxuyaniya ji aliyê Parlamenta Iraqê ve hate dayin, di rûniştina duyemîn a serdema nû de ku wê 25'ê Îlonê roja Sêşemê werekirin, wê dengdana ji bo Serokkomariyê neyê kirin.
Hate ragihandin, di rûniştina parlamentê de wê mijarên; komîsyonên mayinde, rewşa Basrayê û xizmetên bingehîn ên ji bo vê wîlayetê bên nirxandin.
Nehat eşkerekirin bê hilbijartina Serokkomariyê wê kengî bê kirin.



# Pêşengeha Pirtûkan li Dêrikê hate vekirin

**Li Dêrikê duyemîn pêşengeha pirtûka hat vekirin. Pêşengeh wê sê rojan dewam bike. Di pêşengehê de bi sedan pirtûk wê bên pêşandan. Serokê Yekitiya Niviskarên Kurdistanê li Sûriyê Wezna Hamid diyar kir ku ew girîngiyê didin pêşxistina xwendina pirtûkan lewra jî ev pêşengeh girîng in.**





Pênşengeha Pirtûkan a Şehîd Hereok li bajarê Dêrikê het vekirin.
Desteya Çand û Hunerê ya Herêma Cizîrê biryara vekirina duyemîn Pêşengeha Pirtûkan a Şehîd Hereko li Dêrikê da. Pêşengeha roja 22'ê mehê hate vekirin.
Çalakiya roja yekem bi beşdarbûna hejmareke rewşenbîr, endamên tevgerên çand û hunerê, heskiriyên pirtûkan û xwediyên çapxaneyan dest pê kir.
Pêşengeh wê sê rojan berdewam bike. Saziyên çapxane, yekitiyên çandî, Yekitiya Rewşenbîran a herêma Cizîrê, Komeleya Çanda Suryan a Sûriyê, Yekitiya Niviskarên Kurdistanê li Sûriyê, Çapxaneya Dilşêr, Yekîtiya Rewşenbîrên Rojava, Komeleya Nivîskarên Rojava beşdarî pêşengehê bûn. Di pêşengehê de bi sedan pirtûkê wê werin nîşandan.
Serokê Yekitiya Niviskarên Kurdistanê li Sûriyê Wezna Hamid derbarê vekirina pêşengehê de diyar kir ku pêşengeh çandeke pir girîng e. Wezna destnîşan kir ku di pêşengehê de pirtûkên cuda yên di mijara polîtîka, dîrok, wêne û ziman û hwd, têne nîşan dide.
Wezna bal kişand li ser tevlêbûna jinan di pêşengehê de û wiha got: "Tevlêbûna jinan a ji bo pêşengehê balkêş e. Jinên Kurd di her qadên civakê de, bi taybet di xebatên çandê cih digire, hemû pirtûkên kurdî devkî parve dike û ji nifşekê dighîne yê din."…*ANHA*

## Rewşenbîran li kampa Serdemê pirtûkxaneyek vekirin



Li kampa Serdemê ya Şehbayê ku şêniyên Efrînê lê dimînin pirtûkxaneyeke bi navê "Serdem" hate vekirin.
Piştî amadekariyên ku zêdeyî mehekê berdewam kir, Yekitiya Rewşenbîran a Kantona Efrînê bi merasîmekê pirtûkxaneyek bi navê "Serdem" li kampa Serdemê ya navçeya Fafîn a Şehbayê vekir.
Di merasîmê vekirina pirtûkxaneyê de bi dehan endamên saziyên sivîl, rêveberên TEV-DEM û rewşenbîrên herêmê amade bûn.
Di merasîma vekirinê de Hevserokê Yekitiya Rewşenbîrên Efrînê Ûsama Ehmed axivî û diyar kir ku salên beriya 2012'an, rêjîma Sûriyê fikrên rewşenbîran ji bo xizmeta xwe bi kar di anîn.
Rêveberê Kampa Serdemê Idrîs Weqas jî axivî û bal kişand li ser rola rewşenbîran di civakê de û wiha got: "Rewşenbîr di şert û mercên zehmet de têkoşîna xizmeta civakî dikin, vekirina pirtûkxaneyê serkeftineke mezin e. Ji ber vê xebata wan em spasiya rewşenbîran dikin."
Pirtûkxane ji 2 hezar pirtûkên di derbarê polîtîka, civak, dîrok, felsefe, çand û jin yên bi zimanên Kurdî, Erebî û Înglîzî pêk tê…
*ANHA*

## Di bin hemû mercan de wêneyên xwe xêz kir



Hunermendê şêwekariyê Ekrem Zafî di hunergeha xwe de tabloyan xêz dike. Piraniya berhemên wî li gelek bajaran hatine pêşkêşkirin.
Hunermend Ekrem Zafî li taxa El-Salihiyê ya bajarê Hesekê rûdine. Ew di sala 1974`an de li bajarê Amûdê ji dayik bûye.
Ekrem Zafî wiha got, "Di zarokatiya xwe de min peykerên axî çêdikirin. Ew peyker peykerên ajal û mirovan bûn. Lê her çend peyker min çê dikir nêzî 20 heta 100 peyker min di bin erdê de vedişartin bêyî ku ez bizanibim ez çêdikim."
Ji bo naskirina hunera şêwekariyê Zafî wiha got: "Tu agahiyên min bi vê hunerê tune bû. Teknolojî û rojname dereng digihaştin me. Ev karînên min encama xwe pêşxistina min in."
Zafî da zanîn ku wî tenê heta refa 3'yan xwendiye, lê dîsa jî xwendin û nivîsandinê dizane û wiha got: "Heta di vî warî de min perwerde li derekê nedît. Lê belê hemû tabloyên min encama xayelên min in. Bi derbasbûna demê re û pêşketinên ku rû dane bandor li min kir û min hunera xwe bi pêş xist."
Di hunergeha Zafî de gelek tablo, parçeyên dîrokî, pirtûkên hunermendên şêwekariyê û şêwazên nîgariyê li ser refikan hene. Li ser zemîna hunergehê gelek sindoqên boyaxê û alavên boyaxkirinê û her wiha li ser banê hunergehê jî gelek wêne û ayetên olî hene.
Girêdayî mijara pêşangehên berhemên wî, Zafî wiha got: "Min 15 pêşangehên taybet bo berhemên xwe li gelek dewletên cîhanê Sûriye, Lubnan, Tirkiye, Brîtanya û Hollandayê li dar xistin û ez tev li gelek pêşangehên hunermendên din bûme."
Zafî da zanîn ku ew beşdarî gelek panelan li bajarên Amûdê, Kobanê û Reqayê bûye û herî dawî tev li Mîhrîcana Qertac a Hunera Nûjen a Tunisê bûye.
Ekrem Zafî diyar kir ku ew di tabloyên xwe de girîngiyê dide mirovan; çima di şoreşan de mirov tên kuştin? Kî ne ew ên ku şeran bi rê ve dibin?
Di şoreşê de gelek hunermendên herêmê koçberî derveyî welat bûn, lê Ekrem Zafî derneket û mayîna li welat pejirand.
Di dawiyê de hunermendê şêwekariyê Ekrem Zafî bang li aliyên têkildar kir ku girîngiyê bêtir bidin warê hunerî û bi taybet wênesazan…*ANHA*

## Stranên wan ji bo Berxwedana Serdemê ne



Desteya Çand û Hunerê ji destpêka ku xwe li herêmên Şehbayê bi cih kirine, ji zarokên Efrînê re çalakiyan bi rêxistin dike.Di vê çarçoveyê de desteyê di hefteya derbasbûyî de du stran bi navên "Berxwedana Efrînê" û "Bihara Gundê Me" çêkirin. Ew her du stran ji aliyê koma ku ji 5 zarokên Kampa Berxwedan pêk tê, tê pêşkêşkirin. Endamên desteyê di hefteyê de du rojan wan zarokan perwerde dikin.
Endamên Desteya Çand û Hunerê Ferhad Elûş diyar kir balafirên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê îradeya gelê wan neşikand û armancên wan pêk nehatin. Elûş di axaftina xwe de destnîşan kir ku piştî wan berê xwe da herêmên Şehbayê û xwe li wê derê bi cih kirin, wan berxwedana xwe dewam kir, ji ber wê wan stran li ser berxwedana Efrînê û gelê wê çêkirin û di stranên xwe de destnîşan dikin ku wê li warê xwe vegerin û bi vê yekê parastina çanda xwe dikin…*ANHA*



## Hefteya çanda Kurdistan li Brukselê

Derwêş M. FERHO

Di van rojan de 5mîn hefteya çanda Kurdistan li Brukselê pêk tê. Bi filma dokumenter li ser Yilmaz Guney, The Ugly King di 17.09 û resepsiyona vekirinê di 20.09 dest pê kir. Bi daweta Kurdî, bi bûk û zava û hespên xemilandî di nava kuçeyên Bruksel de berdewam e. Çalakiyên curbe-cûr, ji çanda Kurdî, Ermenî, Asûrî, Flamanî, Berber/Kabilî û hwd di nava rojevê de ne. Roja yekşemê 23.09 ber êvarê diqede.
Yekemîn hefteya çanda Kurdistan di sala 2014 de pêk hatibû û her sal ev şahî dubare bû. Hefteya çandê ji aliyê Enstituya Kurdî ya Brukselê, Nav-Bel, Beşa çandî ya KNK bi hevkariya saziyên cuda, Rojava Solidarity Comitee, Info-Türk, Vrede vzw, Mazereelfonds, Ateliers du Soleil, MO, Wezareta çandê ya Flaman, şahredariya Brukselê û gelekên din amade dibe.
Armanca vê hefteya çandê ew e ku li ser herêma em jê hatine, xelkê vira bibin xwedî ramanên nû û derfetên pêywendiyên navneteweyî peyda bibin. Di wê çarçewê de derfeteke ku em bi xwe, xwe bi xelkê din bidin naskirin. Ji sedema ku xêrnexwazên Kurdistaniyan heta roja îro hemû derfetên xwe bi kar anîne û em li ber çavên xelkê din reş kirine. Hefteya çandê, ji bo hemû sazî û beşdaran, seranser mîna cejnê dibuhure. Çalakiyên çandî, konser, pêşangeh, semîner, film, govend, şano, lîstikên zarokan, standên pirtûkan, konê koçeran û gelek tiştên din derbas dibin. Ne bes Kurd, lê gelek komên din ji qada navneteweyî jî bi nasnameya xwe beşdar dibin. Û siyasetmedarên Beljîkî ku bi têkoşîna azadiya Kurdistanê re dost in bi dilxweşî hevkar in. Mînak, di resepsiyona vekirinê de sala bihurî, serokê Parlementoya Flaman, Jan Peumans beşdar bû û got, "bi serbilindî piştgiriya têkoşîna azadiyê li Kurdistan dikim." Beşdarbûn û piştgiriya wî ji bo me serbilidiyek e.
Di resepsiyona vekirinê ya îsal de jî parlementera Flaman ya Brukselê Cieltje Van Achter beşdar bû û dostaniya xwe ji bo pirsgirêka Kurd haşkere anî ziman. Bi giranî li ser girîngiya zimanê dayikê di perwerdê de, xwedîderketin nasnameya xwe, xwedîderketina çanda xwe û îhtîrama mafên merovan li Kurdistan rawesta. Yek ji mabetên ku girîngî dayê, îhtîrama baweriyê bû. Di axaftina xwe de got ku ew bi tu awayî siyaseta dewleta Turk ku dêran/kilîse diguherin mizgeftan napejirînin. "Û heta li Turkiyê demokrasî bi cî neyê, heta Kurd nebin xwedî mafên bingehîn, perwerda bi zamnê dayikê, nasnameya Kurdî nebe rastiyek, heta Azadiya ramanê, baweriyê û siyasetê nebe, ciyê Turkyê di Yekîtiya Ewropa de nine."
Ji bo vê yekê jê xêrnexwaz û dijminê hebûna Kurdan ji detpêkê ve ketin nav deb û dolaban û xwestin vê inisiyatîfê bidin rawestandin. Di qada siyasî de, di nav rayedarên şahredariya Brukselê de dijî van çalakiyên çandî de propagandeke bê bingeh kirin. Ji ber wan sideman jî sala bihûrî şahredariya Brukselê biryara qedexekirinê hefteya çandê da. Sedema vê birayrê jî "ewlekarî" bû. Lê ev biryara wan pûç hate derxistin. Ji ber ku Enstituya Kurdî ya Brukselê doz li hember şahredariyê vekir. Dadgehê ev biryar ne rast dît û hefteya çandê pêk hat. Bi vê yekê gavek girîng hate avêtin. Ango, biryara wan, bi zagona wan bi xwe hate pûçkirin.
Xebatên weha, li Ewropa yan jî welatên din girîng in. Divê em Kurdistanî ji şik û bêbaweriyan azad bibin. Divê em bi xwe bawer bin û xebata xwe bidomînin. Dost û alîgir jî bi hêza me ve girêdayî ye. Kes serê kesekî din naxwerîne.

# Akademiya Îslama Demokratîk vedibe

**Li Bakurê Sûriyê Yekitiya Zanyarên Misilman a Herêma Cizîrê amadekariya vekirina Akademiya Îslama Demokratîk dike. Cîgirê Serokê Meclisa Şêwrê ya Herêma Cizîrê Abdulrehman Bedirxan axivî û got, "em dixwazin rastiya exlaqê Îslamê nîşanî cîhanê bidin. Di akademiyê de em ê rêgez û nirxên rasteqîn ên îslamê şîrove bikin."**

Li Bakurê Sûriyê amadekariyên vekirina Akademiya Îslama Demokratîk dest pê kirin. Yekitiya Zanyarên Misilman a Herêma Cizîrê amadekariya vekirina Akademiya Îslama Demokratîk dike. Di çarçoveya amadekariyan de rêzecivîn bi zanyarên herêmê re têne lidarxistin.
Ji bo naskirina armanca vekirina akademiyê, şertên qebûlkirinê, rêzikname û rêbazên perwerdeyê cîgirê serokê Meclisa Şêwirê ya herêma Cizîrê Abdulrehman Bedirxan axivî û li ser biryara vekirina Akademiya Îslama Demokratîk li herêma Cizîrê wiha got: "Em dizanin ku îslam baweriya aşitî, hezkirin û biratiyê ye. Di dema niha de ji ber siyaset û kiryarên hin rêxistinên terorîst ku bi navê îslamê tev digeriyan, îslam hate reşkirin. Em dixwazin rastiya exlaqê îslamê nîşanî cîhanê bidin. Heger em li geftarên misilmanên destpêkê vegerin em ê bibînin ku banga avakirina civaka exlaqî dikirin."
Abdulrehman Bedirxan, destnîşan kir ku ola îslamê di rastiya xwe de banga demokrasiyê dike û wiha dewam kir: "Demokrasî di aliyê xwe yê siyasî de ew e gel xwe bi xwe, xwe bi rê ve bibe û ola îslamê bi vê mentiqê bang dike, mînaka vê yekê rêgeza şûrayê ye. Aliyê wê yê civakî jî banga hevgirtin û alîkariya muhtacan dike, ev jî demokrasî ye. Her wiha di aliyê xwe yê mirovî de îslam banga parastina mafên hemû gelan dike. Îslam ev maf hemû di serdemekê de ku mirov ne wek hev dihatin hesibandin û zilm belav bûbû, kom kir. Heger em li meclisa mafên mirovan a cîhanî vegerin em ê bibînin ku ji sedî 60 rêgezên xwe ji îslamê digire."
Bedirxan diyar kir ku armanca wan a vekirina akademiyê şîrovekirina rêgez û nirxên rasteqîn ên îslamê ye.



**RÊZIKNAMEYA AKADEMIYÊ**

Têkildarî rêziknameya akademiyê Abdulrehman Bedirxan diyar kir ku rêzikname xwe dispêre hurmeta her kesî û pêkanîna şerîeta îslamê. Bedirxan destnîşan kir ku akademî dê pêşwaziya her du zayendan bike û wiha got: "Her du zayend dikarin di akademiyê de xwe qeyd bikin, hola perwerdeyê ya her du zayendan ji hev cuda ne. Ciwan dikarin bibin îmam û xetîbên mizgeftan, jin jî dikarin li dibistanan dersên olî bidin."
Rêveberiya akademiyê wê perwerdeyan li gorî materyalên îslama navîn a mutedil bide li gorî îslama serdema Mihemed pêxember.
Dersên wê girêdayî dîroka giştî, zanista îslamê, zanista hedîsê, Quran, dersên wêjeyên Kurdî, Erebî û islûb û xîtabetê.
Bedirxan destnîşan kir ku sala din wê ders bi zimanê Kurdî werin dayîn.
Girêdayî şertên tevlêbûna akademiyê Bedirxan diyar kir ku wê îsal pêşwaziya xwendekarên bawernameya navîn û amadeyî bi her du beşên xwe wêje û zanist û peymangehan bike.
Abdulreham Bedirxan anî ziman ku deriyê akademiyê li pêşiya hemû xwendekarên Bakur û Rojhilat vekirî ye û diyar kir ku dema xwendina zanîngehê 4 sal e… *ANHA*

## Kanalîzasyonê Şedadê tên sererastkirin



Piştî gazinên şêniyan, Şaredariya Gel a navçeya Şedadê dest sererastkirina toreyên kanalîzasyonê yên navçeyê kir.
Li gorî agahiyên ku hatine girtin, wê toreyên kanalîzasyonê bi 18 milyon û 500 hezar lîreyên Sûrî werin sererastkirin. Li gorî hevpeymana di navbera Şaredariya Gel û peymandarekî avahîgirtinê de ev proje herî dereng di 80 rojan de pêk bê.
Cîgirê Hevserokên Şaredariya Gel a navçeya Şedadê Husam El-Tean derbarê mijarê de got ku wan bi dirêjahiya yek 1.5 km toreyên kanalîzasyonê danîne.
Husam dawiyê tekez kir li pêşiya şaredariya projeya qîrkirin riyan û gelek projeyên dîtir hene. ew jî wê di demên nêz de pêk werin… *ANHA*

## Kongreya Yekitiya Mamosteyan pêk hat

Kongreya damezrêner a Yekitiya Mamosteyan a Reqayê pêk hat û bi hilbijartina desteya rêveber ku ji 7 kesan pêk tê bi dawî bû.
Kongre bi dûrişmeya"Pêşeroja me bi yekitiya me ye"li eywana El-Tac a Reqayê bi beşdariya gelek şandeyên ji herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, kesayetên navdar û bi dehan mamosteyên herêmê, hat lidarxistin.
Bi navê MSD`ê Hesen Mihemed Elî rewşa siyasî ya herêmê nirxand. Mihemed Elî piştre behsa rola giring a mamosteyan di avakirina nifşekî xwendevan de kir.
Her wiha bi navê Meclisa Sivîl a Reqayê Hesen Mustefa El-Hesen axivî û got: "Erkeke mezin dikeve li ser milê mamosteyan ku fikrê reş di nava zarokan de dema serdema zaliman de hatiye belavkirin, rakin."



Piştî axaftinan, rêziknameya hundirîn hate xwendin û ji aliyê beşdaran ve hate erêkirin.
Li gorî rêziknameyê, ji giringtirin armancên Yekitiya Mamosteyan, parastina mamosteyan û piştgiriya wan di aliyê madî û menewî de.
Di kongreyê de desteya rêveber ku ji 7 kesan pêk tê hat hilbijartin… *ANHA*

## Li Girê Spî riyên mayî tên qîrkirin

Şaredariya Gel a Kantona Girê Spî piştî qîrkirina riyên navçeyên girêdayî Girê Spî bi dawî bûn, dest bi qîrkirina riyên sereke û yên nava bajarê Girê Spî kir.
Şaredariya Gel a Kantona Girê Spî ji bo sererastkirina riyên ku zirar dîtine li gorî bernameyek taybet ji bo navçe û gundên girêdayî kantonê di destpêka meha Tebaxê de ketibû nava amadekiriyan.
Di nav plansaziya ku şaredariyê daniye de, qîrkirina 26 km riyên kantonê heye. Jê 10 km li navçeya Silûk, 4 km li bajarokê Hemam El-Turkmen, 6 km li navçeya Eyn Îsay, 4 km li bajarê Girê Spî û 2 km riya navbera Kantona Girê Spî û bajarê Reqayê de ne.Her wiha şaredariyê diyar kir ku lêçûna projeyê gihaştiye 210 milyon lîreyên Sûrî. li gorî endamê rêveberiya şaredariyê Mistefa Bozî, şaredariyê xebat bi temamî bi dawî kiriye û riyên ku bibûn cihê gilî û gazincên ajokaran sererast bi temamî sererast bûne.Di dawiyê de Bozî tekez kir şaredariyê dest bi qîrkirina riya sereke ya bajarê Girê Spî kiriye ku wê di rojên pêş de xebatên sererastikirina riyên 6 taxên mayî destpê bike… *ANHA*



## Dibistanên herêma Şehbayê vebûn

Dibistanên kantona Şehbayê deriyên xwe ji bêtirî 7 hezar û 500 xwendekarên Efrînê re vekirin.
Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk ev demek e dibistanên Şehbayê amade dike û piştî ku xebatên xwe bi dawî kirin, komîteyê deriyên 29 dibistanên Şehbayê ji 7 hezar û 500 xwendekarên Efrînê re vekirin.
Li gorî rayedaran komîteyê her wiha 944 mamoste ji bo perwerdekirina xwendekaran erkdar kirine. Komîteyê gelek dibistanên kantonê ku di demên şer de hatibûn xirabkirin, sererast kirin.
Komîteyê di 15'ê Îlonê de dest bi qeydkirina dibistanan kir. Li gorî endamên Rêveberiya Komîteya Perwredeyê qeydkirina xwendekaran di asteke gelekî baş de bû û endaman da zanîn ku heta niha 7 hezar û 500 xwendekar hatine qeydkirin.
Hejmareke xwendekaran kêfxweşiya xwe anî ziman û diyar kirin ku wê bi xwendina xwe beşdarî Berxwedana Serdemê ya Efrînê bibin û tu carî dest ji berxwedana xwe bernadin. Mihemed Muslim diyar kir ku artêşa dagirker a Tirkiyê ew ji xwendinê li kantona Efrînê bê par hiştin û wiha got: "Em ê xwendina xwe li kantona Şehbayê berdewam bikin û em tu carî serê xwe ji dagirkeran re natewînin."
Evîn Xelîl jî kêfxweşiya xwe anî ziman û diyar kir ku ew tu car dest ji zimanê xwe yê zikmakî û çanda xwe bernadin û xwendina xwe li Şehbayê berdewam bikin heta ku herêma Efrînê tê rizgarkirin… *ANHA*





# Armanca sereke ya PYD'ê Rizgakirina Efrînê ye

**Hevseroka PYD`ê Eyşo Hiso beşdarî civîneke li Dirbêsiyê ku bi wesîleya salvegera damezrandina PYD'ê hate lidarxistin bû û diyar kir ku armanca partiya wan a sereke rizgarkirina Efrînê ye. Eyşe got, "Ji bo ku gelê me yê Efrînê vegere ser warê xwe em bi hemû hêza xwe dixebitin."**

Hevseroka PYD`ê Eyşo Hiso di civîna ku li navçeya Dirbêsiyê hate lidarxistin de axivî û diyar kir ku ew bi hemû hêza xwe dixebitin da ku Efrînê ji dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê rizgar bikin
PYD`ê bi boneya salvegera 15`emîn a damezrandina partiyê civînek ji endamên xwe yên navçeya Dirbêsiyê re lidar xist.
Civîn li navenda çand û hunerê ya navçeya Dirbêsiyê bi beşdarbûna bi dehan endamên partiyê hate lidarxistin.
Hevseroka PYD`ê Eyşe Hiso di civînê de axivî û rewşa dawî ya Sûriyê nirxand.
Eyşe da zanîn ew wekî PYD bi hemû hêza xwe di her warî de ji bo rizgarkirina Efrînê ji dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê û vegera şêniyên wê bi şev û roj kar dikin û got: "Rizgarkirina Efrînê ji armacên me yên sereke ne."
Eyşe got: "Ji destpêka şoreşa rojava de weke berdewama komployan êrîşên dijwar hatin kirin. Niha jî hemû dewletên herêmî û navnetewî ji bo berjewendiyên xwe li Sûriyê di nava şerekî de ne."





Hevseroka PYD`ê Eyşe Hiso di dawiya gotinên xwe de qala rola PYD`ê di rêxistinkirina civakê de kir û anî ziman ku partiyan wan roleke giring di Sûriyê de lîst û wiha got: "Tevî hemû astengiyan jî, partiya me di navbera hemû partî û pêkhateyên Bakurê Sûriyê de pirek ava kir."

## Xweza bi keda jinan xweş dibe

Jinên kedkar ên Meştela Jîn a li bajarê Dêrikê di derbarê xebatên ku dikin de anîn ziman ku ew bi xebatên xwe yên çandiniyê hem tenduristiya civakê hem jî xwezayê diparêzin û gotin: "Xweza bi ked û vîna jinê xweş dibe."
Piştî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê jinan di her qadên xebatan de cihê xwe girtin. Gelek qadên ji bo jin bixebitin û aboriya xwe geş bikin hatin vekirin. Yek ji van cihên hat vekirin Meştel Jîn a ji aliyê Dibistana Jinê ya Girêdayî Şaredariya Dêrikê hatiye vekirine. Jinên Meştela Jîn ên ku bi karê çandiyê mijûl dibin gotin: "Em gelek kêfxweş in ku em ji bo civak û welatê xwe kedê didin."
Endama Rêveberiya Meştela Jînê Rama Berekat diyar kir ku jin di karê çandiniyê de gelek jêhatî ne û got:"Jin di xwezaya xwe de gelek afirîner in. Niha jî di qada çandiniyê de jin afirîneriya xwe derdixin holê û aboriya xwe geş dikin. Em ê heta dawî piştgiriyê bidin jinan ku di warê aborî û xebatê de xwe pêş bixin."

**JIN JI AXÊ HEZ DIKIN**

Jina Ereb a kedkar a bi navê Celîla Mohemed got: "Em pembû, fêkî, dar diçînin û dema em vê yekê dikin jî em gelek kêfxweş dibin. Çimkî em dizanin ku bi hewldana me civak jî pêş dikeve. Jin ji ber ku ji erd û xwezayê hez dikin loma gelek jêhatî ne. Em ê heta dawî bixebitin û li ser piyên xwe bisekinin."
Celîlayê wiha dawî li axaftina xwe anî: "Dema ku em çandiyê dikin em dermanên kîmyewî bi kar nînin. Ev yek ji bo tenduristiya mirovan û xwezayê baştir e. Armanca me ew e ku em xizmeta civakê û xwezayê bikin. Çimkî xweza bi ked û vîna jinê xweş dibe. Em gelek kêfxweş in ku em ji bo civak, xweza û welatê xwe kedê didin."…*JINNEWS*



## Jinên ciwan pêşengên civakê ne



**Şîlan XOCE**

Endama Desteya Ciwan û Werzîşê li Kantona Efrînê Rengîn Ezet Hibo got: Gelê Efrînê bi pêşengiya jin û ciwanan li hemberî êrişên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê 58 rojan li ber xwe dan. Wê ji vir û pê ve jî bi pêşengiya ciwanan ev berxwedanî mezintir bibe.

**JINÊN CIWAN PÊŞENG IN**

Rengîn Ezet Hibo Endama Desteya Ciwn û Werzîşê ya Kantona Efrînê ji rojnameya me re rol ciwanan di Berxwedana Serdemê de nirxand û ev tişt anî ziman: Hemû beşên civaka Efrînê cihên xwe di berxwedan bê hempa ya gelê Efrînê de girtin. Rengîn bal kişand ser rola pêşeng a jinên ciwan û ev tişt li gotinên xwe zêde kir: Di hemû çeperên berxwedaniyê de jinên ciwan hebûn. Li hemberî dagirkeriyê şer dikirin, birîndar vediguhestin û desteka pêwîst li hemû qadên berxwedanê didan. Jinên ciwan bi ruhê ciwantî û bi pêşengiya serkeftî dikarin rê li ber dagirkeriyê bigirin.

**PERWERDE GIRÎNG E**

Endama Desteya Ciwan û Werzîşê di dewama nirxandinên xwe de got: Piştî koçberiya bi zorê, jinên ciwan careke din li Şehbayê xwe ji nû ve bi rêxistin kirin. gelek navendên ciwanan hatin vekirin. komîteyên ciwanan (perwerde, ragihandin, tendirustî, parastin,… hwd) hatin avakirin. Rengîn li mesela perwerdê tekez kir û got: Perwerde ji bo jinên ciwan bi qasî nan û avê girîng e. Ji bona ku ciwanên me rewşa ku dijîn paş şîrove bikin û mane bidin tegehên dagirkerî û koçberiya bi zorê, pêwîste xwe ji perwerdeyan qut nekin. Ancax bu riya perwerdeyan jinên ciwan mewziyên xwe yên pêşengtiyê ji dest nedin.

**EM Ê ERKAN PÊK BÎNIN**

Rengîn destnîşan kir ku: Li Efrînê jina Kurd rastî hemû cureyên tadeyên derexlaqî yên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê tê. Rojana rastî destdirêjî, tecawiz, û kuştinê tê. Endama Desteya Ciwan û Werzîşê Rengîn Ezet Hibo di dawiyê de got: Wê ciwan bê navber ji bo rizgarkirina Efrînê di nav tevgera xwe birêxistinê de bin. Pêwîste jinên ciwan li her dera cîhanê tevlî pêngava rizgarkirina Efrînê bibin û erkên pêşengitiya dîrokî yên li ser milê xwe pêk bînin.

## Piştî rizgarkirina Reqayê jin di hemû xebatan de çalak in



Piştî rizgarkirina Reqayê ji aliyê hêzên QSD'ê de jin di hemû warên civakê de bi rengekî çalak cih digre û beşdarî xebatan dibe.
Piştî ku çeteyên DAIŞ`ê bajarê Reqayê dagirkirin û çar salan lê hikûm kirin hemû qanûnûn paşverû ku îradeya jin û civakê tune dike li ser gel û bi taybet li ser jinan ferz kirin.
Piştî ku QSD`ê bajarê Reqayê ji dagirkeriya DAIŞ'ê rizgar kir, jinan jî di hemû qadên civakê de xwe birêxistin kir û tev li xebatan bûn.
Weke gava yekemîn ku jin bibin xwedî îrade û rola xwe di civakê de bilîzin, Meclisa Jinê ya Reqayê hate avakirin.
Meclisa Jinê piştgiriya hemû jinan dike û hewl dide ku jin beşdarî hemû xebatên civakî û siyasî bibe. 6 komîteyên meclîsê bi awayekî çalak xebatên xwe dikin. Her wiha jin heftane perwerdeyên xwe dibînin.
Têkildarî mijarê Endama Meclisa Jinê ya Reqayê Xaliye El-Kecwan destnîşan kir ku ew ji bo piştgiriya jinan di hemû waran de dixebitin û wiha got: "Piştî ewqas salên ku jinan zilm û zarodarî ji destên DAIŞ'ê dîtin jin niha careke din bi rola xwe ya pêşeng a di civakê de radibin."
Xaliye diyar kir ku ew ji bo pêşxistina jinan û çalakkirina rola wê di hemû saziyan de, bi hemû jinên di hemû saziyên sivîl de di nava danûsdandinê de ne.
Endama Meclisa Jinê ya Reqayê Xaliye El-Kecwan di dawiyê de wiha got: "Ji bo vekirina werşeya dirûnê ya jinan, vekirina Meclisa Jinê li El-Meşleb, vekirina bexçeyê zarokan, çalakkirina malan û amadekariyên xwarinên zivistanê, em xebatên xwe didomînin."…*ANHA*

# Ocalan di nava tecrîdê de hatiye tecrîdkirin

**Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan têkildarî 'cezayê dîsîplînê' û tecrîda li ser Ocalan li avahiya HDP'ê ya Stenbolê civîna çapemeniyê li dar xist. Bûldan diyar kir ku 20 sal in li ser Ocalan tecrîd heye û got, "Birêz Ocalan di nava tecrîdê de hatiye tecrîdkirin." Buldan di serî de CPT bang li saziyên li Ewropayê kir ku têkildarî rewşa Rêber Ocalan tavilê bikevin nava liv û tevgerê.**

Hevseroka Giştî ya HDP'ê û Endama Heyeta Îmraliyê Pervîn Bûldan diyar kir ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di nava tecrîdê de hatiye tecrîdkirin.
Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan û Berdevka Meclîsa Jinan parlementera HDP'ê ya Agiriyê Dîrayet Dîlan Taşdemîr têkildarî 'cezayê dîsîplînê' û tecrîda li ser Ocalan li avahiya HDP'ê ya Stenbolê civîna çapemeniyê li dar xistin.
Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan di civînê de axivî û diyar kir ku ew dixwazin balê bikişînin ser êrîşên li ser Ocalan.
Bûldan diyar kir ku 20 sal in li ser Ocalan tecrîd heye û got, "Parêzerên Ocalan di 6'ê Îlona 2018'an de ji bo hevdîtina bi Ocalan re daxwazname dane û daxwazname hatiye redkirin. Hinceta redkirinê jî cezayê dîsîplînê yê li ser Ocalan hatiye diyarkirin. Di heman demê de girtiyên din ên li Girtîgeha Îmraliyê jî bi heman hincetê, hevdîtina wan hatiye redkirin.
Bi vê biryara di 6'ê Îlonê de hevdîtinên bi Ocalan re 6 mehan hatiye qedexekirin. Di biryara 2'ê Adara 2018'an de jî ji parêzeran re hatibû ragihandin ku mafên ragihandin, ziyaretvan û hevdîtinên bi telefonê hatiye qedexekirin. 11 cezayê hucreyê yên ku di navbera



salên 2005-2009'an de li Ocalan hatine birîn û nameya wî ya di sala 2009'an de ya 156 rûpelî ji bo qedexekirinê hincet hatiye nîşandan.

### OCALAN DI NAVA TECRÎDÊ DE TECRÎDKIRÎ YE

Rêzdar Ocalan ne kesekî ji rêzê ye û Îmrali jî ne girtîgeheke ji rêzê ye. Em tevkariya Ocalan a ji bo aşitî û ya li ser raya giştî ya gelê Kurd û raya giştî ya Tirkiyê.
Birêz Ocalan careke din di nava tecrîdê de hatiye tecrîdkirin. Birêz Ocalan 20 sal in tê tecrîdkirin û demeke dirêj nekariye malbatê, heyetên siyasî û parêzeran bibîne.
Bi pêvajoya aşitî û danûstandinê re hevdîtinan dest pê kirin û malbatê ew dîtin. Lê belê demeke dirêj destûra hevdîtinê nayê dayin.
Em ji rayedaran dipirsin: Ev ceza çima di navbera salên 2005 û 2009'an de bi cih nehatin anîn, lê niha bi cih tên anîn? Em zanin ku edalet nîne, lê belê tiştekî manîdar e ku hevdîtina Birêz Ocalan a bi parêzeran re piştî 13 salan tê astengkirin.

### BANG LI CPT HATE KIRIN

Di serî de CPT em bang li saziyên li Ewropayê dikin ku têkildarî rewşa Birêz Ocalan tavilê bikevin nava liv û tevgerê. Mirovek wê nikaribe parêzer û malbata xwe bibîne û di ser re cezayê dîsîplînê lê bê birrîn. Ev yek rewşa hiqûqê ya li Tirkiyê radixe pêş çavan. Der barê vî cezayê dîsîplînê de em li benda bersiveke Wezareta Edaletê ne.
Em vê daxwazê hem li hikumetê, hem jî li Wezareta Edaletê dikin. Bûyerên li Rojhilata Navîn diqewimin bi taybetî yên li Tirkiyê rû didin, nîşan didin ku divê hevdîtina bi Birêz Ocalan re tavilê dest pê bike. Em pê zanin ku dema hevdîtin bi Ocalan re were kirin wê Tirkiye ji nava krîz û kaosê derkeve. Me dît ku dema hevdîtin dihatin kirin krîz û kaos nedibûn. Piştî ku deriyên Îmraliyê hatin girtin, hewldana darbeyê pêk hat. Birêz Ocalan di vê mijarê de hişyarî dabû.
Tecrîd sûcekî li dijî mirovahiyê ye. Herî zêde li Girtîgeha Îmraliyê hatiye kirin. Tecrîda ku di nava tecrîdê de tê kirin, ne tiştek e ku bê qebûlkirin. Hem bi navê HDP'ê hem jî bi navê heyeta Îmraliyê dixwazim bêjim ku divê tecrîdkirina Birêz Ocalan tavilê biqede."

## Li Îmraliyê tecrîdeke giran heye



Hevberdevka HDK'ê Koçyîgît di Civîna Meclîsa Giştî ya 5'emîn a Serdema 8'emîn a HDK'ê de axivî û got, "Heta ku em li hemberî tecrîda li Îmraliyê dengê xwe bilindtir nekin, em nikarin qala wekhevî û azadiyê bikin."
Civîna Meclîsa Giştî ya 5'emîn a Serdema 8'emîn a Kongreya Demokratîk a Gelan HDK'ê li Stenbolê li avahiya wê pêk hat. Hevberdevkên HDP'ê Onûr Hamzaoglû û Gulistan Kiliç Koçyîgît û pêkhateyên HDK'ê tevlî civînê bûn.
Hevberdevka HDK'ê Gulistan Kiliç Koçyîgît diyar kir ku divê ew herî zêde hay ji Girtîgeha Îmraliyê hebin û got, "Beriya Rewşa Awarte hevdîtina bi Ocalan re dihat astengkirin, niha jî derket holê ku cezayê dîsîplînê li wî hatiye birîn. Bi hincetên pûç hevdîtin tên astengkirin. Me berê gelek caran got, heta ku tecrîda li Îmraliyê ranebe, heta ku pergala hiqûqî ya Îmraliyê neyê teşhîrkirin û deng ji tecrîdê re neyê derxistin, mirov nikare qala wekhevî û azadiyê bike."

### BANDORA TIRKIYÊ YA LI SER ÇETEYAN

Koçyîgît qala meseleya Îdlîbê jî kir û got, "Diyar e ku heke şerek li wê derê pêk were, ew ê trajediyên mezin pêk werin. Tê dîtin ku Tirkiye ji bo çete dev ji çekên xwe berdin û herin herêmeke tampon îro bûye welatekî garantor. Gelo ev bandora Tirkiyê ji ku tê? Divê em li vî tiştî bipirsin."

## Bi tecrîdê dixwazin kaosê kûr bikin



Parlamentera HDP'ê Dîrayet Dîlan Taşdemîr got, hikumeta AKP'ê hewl dide bi bahaneyeke nû tecrîda li Îmraliyê rewa bike.
Parlamentera HDP'ê ya Agiriyê Dîrayet Dîlan Taşdemîr bal kişand ser qedexekirina hevdîtinên parêzeran ên bi Ocalan re ku bi bahaneya cezayê dîsîplînê 6 mehan hate qedexekirin û got, "ev yek nîşaneya sîstema taybet a li Îmraliyê ye."
Taşdemîr got, "desthilatdarî û dadgeriya wê ku bi hincetên "rewşa nebaş a hewayê", "keştî xerabe ye" hewl dide tecrîdê rewa bike, niha jî bi cezayê dîsîplînê dixwaze şer û kaosê giran bike.
Taşdemîr diyar kir ku ev 20 sal in li Îmraliyê hiqûqa navxweyî û navneteweyî tê binpêkirin û bi bîr xist ku tecrîdkirina Ocalan van sê salên dawî gelekî giran bûye.
Taşdemîr got, "Birêz Ocalan nikare bi parêzer, malbat an jî kesekî din re biaxive. Lewma em nizanin bê li Îmraliyê çi diqewime. Bingeheke vê pêkanînê nîne; nêzîkatiyeke polîtîk a kêfî ye. Desthilatadrî û dadgeriya wê ku bi hincetên 'rewşa nebaş a hewayê', 'keştî xerabe ye' hewl dide tecrîdê rewa bike, niha jî bi cezayê dîsîplînê dixwaze şer û kaosê giran bike. Nabe ku em vê yekê qebûl bikin."
Taşdemîr anî ziman ku sedema cezayê dîsîplînê nehatiye eşkerekirin û destnîşan kir ku ew ji ber rewşê gelekî bi fikar in. Taşdemîr got, "Ji 27'ê Tîrmeha 2011'an û vir ve parêzer, ji sala 2016'an û vir ve jî malbat nikare Birêz ocalan bibînin. Gelo qala kîjan cezayê dîsîplînê dikin? Wê wextê êrîş li dijî îradeya Birêz Ocalan tê kirin. Divê ev yek tavilê ji raya giştî re were vegotin."
Dîrayet Taşdemîr diyar kir, rejîma taybet a li Îmraliyê di heman demê de beşek ji konsepteke navneteweyî ye û ragihand, bêdengiya CPT û saziyên mîna wê ji ber vê yekê ye.
Taşdemîr got, "Cezayê dîsîplînê yê li lîderekî ku ji aliyê bi milyonan kesî ve weke îradeya wan hatiye qebûlkirin, êrîşek li dijî îrade û rûmeta mirovan e."
Taşdemîr diyar kir ku tecrîdkirina Ocalan û bûyerên li Rojhilata Navîn û Rojava diqewimin ji hev cuda nînin û destnîşan kir ku bahaneya nû ya ji tecrîdê re hatiye dîtin nîşaneya konsepteke nû ey.
Taşdemîr da xuyakirin, bi rêya tecrîda li Îmraliyê hewl tê dayin ku şer û kaos giran bibe û got, "Tezên Birêz Ocalan ên li ser Rojhilata Navîn niha weke rêyeke sêyemîn tê dîtin. Ji ber vê yekê, ev tecrîd li dijî tezên rêya sêyemîn û îradeya jiyana bi hev re ya gelan e. Weke gefeke vekirî tê dîtin. Em zanin ku têkoşîn û berxwedana 20 salan a Birêz Ocalan a li Îmraliyê ji bo gelên Tirkiye û Rojhilata Navîn e, ji bo jinan e û perspektîfek e ku têkoşîna demokrasiyê xurt dike."
Taşdemîr herî dawî bang li her kesên ku dixwazin Tirkiye bibe welatekî demokratîk kir ku li dijî tarîtî û rejîma taybet a li Îmraliyê dengê xwe bilind bikin û got, "Divê Birêz Ocalan tavilê azad bibe."



## Şaredarî ji bo kurdan çi ye

Tayip TEMEL

Di rêya rêxistinkirina civakê de yek ji çeperên mezin şaredariyên gel in. Siyaseta demokratîk a kurd bi qasî 15 sal in li piraniya bajarên Kurdistanê rêveberiyên herêmê (şaredariyên bajar û navçeyan) bi dest xistine.
Piştî bidestxistina van çeperên girîng ên siyasî û civakî, siyaseta demokratîk a kurd bi feraseta 'xwerêveberiya civakî' li hemberî gelek zîhniyetên çepel û qirêj têkoşîn meşand.
Dewletê şaredarî wekî navnîşana rant û qezenca aborî nîşan dabûn. Piraniya civakê jî şaredarî wekî saziyeke ku kar ji wan re bibîne bi nav dikir.
Lewre jî pir zehmetî hat kişandin heta ku şaredarî wekî saziyên şoreşa civakî û guhertina zîhniyetê bên fêmkirin. Zehmetî ji ber wateya ku pergalê li van saziyan bar kiriye tê jiyîn.
Tê zanîn ku qezenckirina şaredariyan ji aliyê gelê kurd ve wekî şoreşeke siyasî hat binavkirin û dîtin. Di çend salên derbas bûn de ev şoreşa polîtîk di xebatên şaredariyan de ber bi veneguhestina şoreşa civakî ve çû.
Bêguman gelek kêmasî û û qelsiyên şaredariyan hebûn. Hê jî hînbûn û nexweşiyên ku dewletê di van saziyan de afirandiye ji holê ranebûye. Lê bi taybetî piştî aşkerakirina 'Xwerêveberiyên Demokratîk' şaredarî êdî dibûn kozikên têkoşîna azadiyê yên ku bi gelek xebatên xwe li hemberî aşê asîmîlasyon bûn kelehên berxwedanê.
Rêveberiyên Herêmî û bi taybetî jî şaredarî komunên herî kevnar ên dîroka mirovahiyê ne. Siyaseta Kurd rêveberiyên herêmî ji wateya ku dewletê li wan bar kiriye rizgar kirin.
Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji destpêkê heta îro bi israr dixwest şaredarî bibin bingeha xwerêvebirina civakê. Di çarçoveya paradîgmaya xwe ya civakparêz de hewl da ku şaredarî bi xebatên xwe yên aborî, çandî û civakî veguherin komunên xweser û demokratîk.
Şaredarî wekî gotin tê wateya gelparêziyê û şaredariyên kurd ên DBP'ê hêdî hêdî li gorî vê mîsyonê tevdigeriyan.
Ji ber vê yekê dewletê bi hemû hêza êrîşî şaredariyan kir û ewilî hevşaredar û endamên meclisan binçav kirin û girtin.Bi qasî 100 şaredariyên gel desteser kirin û bi dehan hevşaredar û endamên meclisê hatin binçavkirin, girtin û hemû ji peywirê hatin dûrxistin. Lê tevî van êrîşan jî hevşaredaran di nav gel de xebatên xwe domandin. Gelê kurd baş dizane ku bi desteserkirina şaredariyan, desthilatdariya AKP'ê pêlî îradeya wî kir.Parlementer, siyasetmedar, jin, zarok û kal bi hezeran kurd hatin girtin û ew di zîndanan de ne. Lê dûrxistina ji peywirê ya şaredaran û girtina wan xwedî wateyek gelek giring bû. Piştî desteserkirina şaredariyan, dewletê bi destê qeyyûman bi taybetî êrîşî nirxên pîroz ên gelê kurd ên wekî; ziman, çand û azadiya jinê kir. Bi van kirinên wan mirov baştir fêm dike ku êdî diyar bûye şaredarî û rêveberên herêmî kelehên pêşvebirina huner û feraseta xwebirêvebirina xwecihî ne. Têkçûna wan têkçûna civakê ye. Lewre civaka kurd xwe amade dike ku ji vê feraseta dagirker û înkarê hesabê bipirse.



# Em ê dagirkeran ji Efrînê derxînin

**Meş û çalakiyên li dijî dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê û her wiha ji bo piştgiriya berxwedana Efrînê dewam dikin. Bi hezaran welatiyên Tirbespîyê, Girkê Legê, Çilaxa û Til Koçer ji bo piştgiriya berxwedana Efrînê meşek lidarxistin. Meşa ku li Tirbespiyê hat lidarxsitin veguherî mîtîngê. Di mîtîngê de axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku rizgarkirina Efrînê erka hemû gelên Sûriyê ye.**

Bi hezaran welatiyên Girkê Legê, Çilaxa û Til Koçer bi armanca şermezarkirina kiriyarên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li Efrînê û piştgiriya Efrînê meşek li dar xist.
Meş li Qada Şehîd Xebat Dêrik a navçeya Tirbespiyê hate lidarxistin.
Di meşê de durûşmeyên "Efrîn em heta dawiyê bi te re ne" hatin berzkirin. Her wiha pankartên bi nivîsa "Rizgarkirina Efrîn û rizgarkirina Sûriyê ji dagirkeriya Tirkiyê erka me ye", "Na ji guherandina demografya Efrînê re" hatin hildan.
Meş li kolana giştî veguherî mitîngê. Li vê derê Hevserokê Meclisa Navçeya Girê Legê Mihemed Cemîl axivî û destnîşan kir ku azadiya gelan û pêkanîna pîvanên neteweya demokratîk yek ji pîvanên sereke yên gelê herêmê ye û wiha got, "Ji ber wê her kes li Bakurê Sûriyê ji bo rizgarkirina Efrînê çalakiyan li dijî dagirkeran li dar dixin. Ji ber ku armanca dewletên desthilatdar guhertina demografya Sûriyê ye û bi rêya komên xwe yên çete xaka wê dagir bikin û civakê ji hev bixin."
Endamê Akademiya Civaka Demokratîk a navçeya Çilaxa Umer Hebûn jî got, "Rizgarkirina Efrînê erka hemû gelên Sûriyê ye.Dijmin û bi taybet Tirkiye dixwazin demografyaya herêmê biguherin û tevliheviyê di navbera gelan de çêkin." Umer Hebûn bêdengiya navdewletî ya li dijî komkujiyên dagirkeran li dijî gelê Efrînê şermezar kir.
Ji rêvebrên Kongreya Star Zelfe Bedro jî axivî û destnîşan kir ku gelê Bakurê Sûriyê piştî ku pîvanên neteweya demokratîk pêk hatin, wateya azadiyê baş nas kir û wiha got: "Em ê asta têkoşîna xwe bilind bikin da ku em ji dagirkeriya Tirkiyê rizgar bibin û rêberê neteweya demokratîk Abdullah Ocalan ji girtîgehê dexînin."
Mitîng bi duruşmeyên berxwedana Efrînê bi dawî bû.



## Em ê Efrînê ji dagirkeran rizgar bikin



Tevgera Ciwanên Rojava li bajarê Girê Spî meşek lidarxist û diyar kir ku ew ê bi têkoşîna xwe Efrînê ji dagirkeriyê rizgar bikin.
Bi armanca şermezarkirina dagirkeriya dewleta Tirk û komên çete yên girêdayî wê yên li dijî Efrînê, Tevgera Ciwanên Rojava meşek li bajarê Girê Spî pêk anî. Bi sedan ciwan û welatiyên Grê Spî beşdarî meşê bûn.
Meşê ji Çerxerêya El-Elem a rojavayê bajarê Girê Spî dest pê kir û ber bi Çerxerêya El-Qefes ve dewam kir. Di meşê de bi dirûşmeyan dagirkeriya Tirk hat şermezarkirin. Di meşê de wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, alên Yekitiya Ciwanên Rojava, YPG, YPJ û QSD'ê hatin bilind kirin.
Hevserokê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a kantona Girê Spî Hemdan El-Ebid axivî û wiha got: "Em pişta xwe nadin Amerîka, Rûsya, Tirkiyê û ne tu aliyên din û ne Cinêv, Astana û Soçiyê. Em ê bi hevgirtin, yekitiya xwe axa xwe ku bi xwîna pîroz a şehîdan hatiye avdan, rizgar bikin. Kesên parastina welatê xwe nekin ne hêja ne ku li ser axa welat bijîn. Efrîn niha dagirkirî ye û bi yekitiya me û girêdana me bi doza me ve bêguman em ê Efrînê ji dagirkeriyê rizgar bikin."
Li ser navê Yekitiya Jinên Ciwan Rîhab El-Hemadî û li ser navê meclisa kantonê Kamil Mehmûd axivîn û li dijî dagirkeriyê banga hevgirtinê li pêkhateyan kirin û dan zanîn ku gelê Sûriyê tu carî bi van siyasetên dagirkeran nayên xapandin û diyar kirin ku wê têkoşîna xwe li ser xeta Ocalan û şehîdan heta rizgarkirina hemû gelên bindest bidomînin û gotin, "rizgarkirina Efrînê rizgarkirina hemû Sûriyê ye.
Meş bi duruşmeyên rizgarkirina Efrînê bi dawî bû..

## Ajanekî MÎT'ê li Babê hate kuştin



Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê ragihand ku 'ajanekî xwedî tecrûbe' yê li Babê ji dewleta Tirk re dixebitî hatiye cezakirin. Di daxuyaniyê de hate gotin, ajanê navborî li Efrînê cihê xwe di êrîşa dijî sivîlan de jî girtibû.
Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir, ajanekî dewleta Tirk ê ku li Efrînê sivîl kuşt û êşkence dikir, li Babê hatiye girtin û cezakirin.
Daxuyaniya Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê wiha ye:
"Li rex zêdebûna çalakiyên şervanên me li dijî leşkerên artêşa Tirk û çeteyên wê li Efrîn, Idlibê, Ezazê û hemû herêmên Bakurê Sûriyê, vê dema dawî hin kesên xayîn ku danûstandinê bi dagirkeriya Tirkiyê re dikin derketin û hewl didin ajantiya dualî bikin. Van xayînan xwestin şervanên me bixapînin û di heman demê de danûstandinê bi dagirkeran re dikin, da ku destdirêjiyên qirêj li dijî gelê me pêk bînin. Me weke Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê girêdayî vê mijarê gelek daxuyanî weşandin û me xayîn hişyar kirin ku destdirêjî û kirinên xwe rawestînin. Me gelek caran piştrast kir ku şervanên me di asta herî jor de baldar in ku dikarin van xayînan eşkere bikin û ceza bikin. Lê hin ji van çeteyan hewldanên xwe yên xapandin didomînin û bûne amûrên qirêj di destên dagirkeran de.Yek ji van çeteyan kesê bi navê Ehmed Zekeriya El-Mihemed e û weke ajanekî pispor li ba dagirkeriya Tirkiyê li herêmê dixebitî û agahiyên istixbaratî û navên welatiyên sivîl ên Efrînê berhev dikirin da ku li dijî wan çalakiyên kuştinê pêk bîne. Vî ajanî û komeke çeteyên li rex wî rêze kuştin li dijî sivîlan pêk anîn. Şervanan tevgera xayîn Ehmed El-Mihemed ji nêz ve li Babê şopandin û piştî ku girtin û li xwe mukur hat şervanan di 16'ê Îlona 2018'an de ew ceza kirin.
Em weke odeya çalakiyan a Xezeba Zeytûnê, em careke din van xayînan hişyar dikin ku her çiqas baldar bin wê bêne eşkerekirin û wê bêne cezakirn. Em piştast dikin ku em ê çalakiyên xwe heta ku dadgehên sivîl ên Efrînê ji nû ve ji aliyê welatiyên wê û rêveberiya xweser ve tên avakirinê berdewam bikin. Em hemû xayînên ku me girtine radestî van dadgehan bikin da ku bêne cezakirin."



## Camiya Emewî nebû, ya Kolnê heye

Burhan ERDEM

Erdogan tu ne bi xêr hat!` Slogan e. Di van rojan de her tê bihîstin. Cihê vê sloganê kolanên Almanyayê ye. Ev demeke dirêj e nerazîbûnên mezin ên li ser hatina Serokomarê Tirk Recep Tayîp Erdogan berdewam dikin. Siyaseta Almanyayê wê gotina dîplomasiya sipî ku ji bo dîktatorên Amerîkaya Latîn di serî de, ji bo despotên li herderê cîhanê dihate bikaranîn pejirandine. Di devê wan de ew tarîf heye; "Belê dîktator e, lê dêktatorê me ye!"
Li nava raya giştî ya Ewropayê û bi taybetî, ji ber girêdana xwe ya mezin a bi Tirkiyeyê re, li Almanyayê dîktatorbûna Erdogan bê şik û şiphe ye. Çapemeniya Ewrûpî, wî bi karîkaturên şibandina Hîtler her tîne rojevê. Di nava siyasetmedarên cîhanê de yê jê herî nayê heskirin, belkî piştî Serokdewletê li Qesra Sipî Donald Trump, Serokê li Kulliyeya Qesra Ak Sarayê Recep Tayîp Erdogan e. Ne di rêza yekem de be jî, rêza duwem a rêveberê jê tê nefret kirin, ji wî re ye.
Lê siyaseta qirêj a Yekitiya Ewrûpayê her çiqwasî bi eşkereyî rexne bike jî, di her dema wî ya zahmet de, desteka xwe ya ji Erdogan re kêm nekiriye. Gelek kes vê yekê bi şantaja Erdogan a rêdayina çûna pênaberan a ber bi Ewrûpayê ve girêdidin. An jî, hebûna bazareke mezin a Tirkiyeyê ya ji bo sermayeya Ewrûpî. Di dema astengkirina endametiya Tirkiyeyê ya ji bo Yekitiya Ewrûpayê de jî, hin kesan, bi daxwaza hebûna ola îslamê ya li vê parzemînê ve, rewşa destekdayina rêveberiya AKPê vedigotin.
Lê ji vê yekê wêdetir tiştek dixuye. Ew tişt jî, pêwistiya tunebûna dengeyê ye. Gelekî eşkere ye ku, Tirkiyeya xwe ji fobiya destkeftiyên kurdan rizgarkirî, dikare li rojhilata navîn bibe xwediya dengeyê. Bi vê xwedîtiyê jî, wê karibe bibe hêzeke pêbawer a herêmê. Ji xewna Osmantiyê mezintir, we ji bo ahenga Asya û Ewrûpayê, bibe rastîn kevirê mîhengê. Di pêvajoya çareseriyê de ev dîtin dihate bilêvkirin. Lê pêkhatina vê yekê, dawî li îktidara Tirk dianî. Ya nehate qebûlkirin ev bû. Ewrûpiyên di pêkhatina îktidara Tirkîtiyê de xwedî par in, riya dinê nîşanî AKPyiyan dabûn. Riya dîktatoriyê…
Berê Erdogan li Sûriyeyê bû. Bi xiyala xwe gihandina Heleb û Şamê nevîtiya Osmaniyan dikir. Bi carekê re dostaniya xwe ya bi Esad re, -ku li ser rêlbergirtina destkeftineke muxtemel a Kurdan bû- xira kir. Dest bi xwedîkirina xwedêgiravî muxalifan kir. Bi hest û ramanên xwe yên ji îdeolojiya Îxwan mayî, bi kîsweya nûneriya muslumantiyê rabû heta bakurê Efrîkayê rê da ber xwe. Li dû wî jî ew murîdên ji xwe çûyî…
Di vê demê de piştgiriyerke mezin ji Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Yekitiya Ewrûpayê peyda kiribû. Tirkiye weke dewleteke xwediya rêveberiya îslama modere, weke mînak dihate nîşandayîn. Erdogan û şûrekeya xwe, bi vê metihdayinê ji xwe çûbûn. Slogana xwe ya sereke kiribûn limêja li camiya Emewî. Lê nekirin para wî. Heta ev yek bi destê van hêzên piştgiriya wê dikir, hate astengkirin. Niha ev hêz jê re dibêjin; Camiya Emewiyan nebû, lê va ye Camiya Kolnê heye! Lê wê şertên limêja li camiya bajarê kolnê gelek dijwar bin û belayên mezin bîne serê gelan…